



Perwerdeya Baş di serî de

Kita

Dibistan

Ziman

Alîkarî

Tenduristî





Rêberek ji bo pîrsên we

Ji bo malbatên ku tên Mûnster, ji bo wan li bajêr gelek tişt nû e. Eger hûn ji derveyî welêt tên, hûn herhal bi sîstema perwerdeyî û bi ya dibistanê ya Alman nizanin.

Bajarê Mûster dixwaze, ku hûn ji bo zaroka xwe pêşniyara rast bibînin.

Li Mûnsterê ji bo zarakên we gelek îmkânên alîkarî û yên dibistanê hene.

Di rûpelên jêr de li ser pîrsên we:

- Ji bo zarakên piçûk kîjan alîkarî heye?
- Zaroka min dikare here kîjan Dibistanê?
- Sîstema dibistanê çawa dixebite?
- Li ku û çawa zarok fêrî almanî dibin?
- Ez dikarim çi bikim, eger ji bo zaroka min alîkariya taybet pêwîst be?

> Ji bo pîrsên we:

Ciyên laîq ji bo van û pîrsên dinan li ser babetên alîkarî, perwerdeyî û alîkariya zarakên we hûn dikarin di beşê navnîşanan de bibînin. (*binêhire rûpel 20-30*).

Hûn dikarin serî li Integrationratê (Konseya Întegrasyonê) jî bidin, ew daxwazên însanên biyanî yên ji derve hatibin diparêz e. (*Navnîşan binêhire rûpel 23*)



Hêlîna Zaroka û Lênêhêrîna Zarokan biroj

Alîkarî ji bo yên herî piçûk

Gelek formên çûda yên alîkariyê ji bo zarakên beriya ew herin dibistanê hene. Zaroka we dikare here Kindertagesstätte (Kita), heta ku ew dest bi çûna dibistanê bike. Li kitayê ew dibe xwedî tecrübeyên ewil bi zarakên re ku ew jî di salên wan de ne. Bi listikî fêrî ziman dibe û çandê nasdike û di vê pêşketinê de ew bi awayekî profesyonel alîkariyê dibîne. Çûna kitayê bi awayekî azad e. Eger zaroka we yek salî ye mavê we yê yasayî ji bo ciyekî li kitayê yan jî li Kindertagespflege heye.

Alîkariya ras bibînin

Rex kitayan Tagesmütter (Dayîkên rojê) û Bavên rojê (Kindertagespflege) hene, ew di komên piçûk de heta zarok bibin sê salî alîkariya wan dikin. Hûn agahiyan li ser vê di www.stadt-muenster.de/jugendamt/kindertagesbetreuung de dbînin.

Eger hûn bixwazin zaroka xwe ya ku temenê wê hîn ne bûye sê sal jî aliyê Tagespflegeeltern (Dê û bavên rojane) alîkariyê bibînin, hûn wana, beriya ku alîkarî dest pê bike, nas dikin.

Ji bo Kita û/yan jî Lêmêzekirina rojane ya zarokan qeyid kirin

Sala Kitayê bi asayî di 1.tebaxê de dest pê dike. Hûn dikarin zaraoka xwe her dem bi rêya Kitanavigator qeyid bikin. Ji bo hilgirtina dezgeya zaroka ya rojane bo meha tebaxê qeyid kirin di dawiya 31.1. ya wê sale de xelas dibe. Gelek Kitas çalakîyê agahdarkirinê ji bo dê û bavan pêşkeş dikin.



Ji bo Kindertagespflege qeyda ji bo salekê mumkun e. Qeyida ji herdû formên alîkariyan tenê li ser Kitanavigator: www.kita-navigator.stadt-muenster.de çêdibe. Familienbüro (Buroya Ailan) li ser hemû pirsên derheqên babetên Kindertagesbetreuungê agahdar dike û di warê Kitanavigatorê de alîkariya we dike. Sozialdienst (Xizmeta civakî) alîkariyê di cihgerînê dide dide zarokên ku malbatên wan penaber in.

> **Ji bo pîrsên we:**

Familienbüro, Tel. No. 02 51/4 92-51 08
 Sozialdienst für Flüchtlinge, Tel. No. 02 51/4 92-50 41
 (Navnîşan binêhire rûpel 22)

Alîkarî bi çiqasî ye?

Hûn weke dê û bav ji bo alîkariyê ya di kitayê yan jî ya di Kindertagespflegeperson (kesê rojane alîkarî dike) de çiqasî bidin, girêdayî qezenca we ye. Qezenca malbatê heta 37 000 € birut (bê perê zarokan) cîhê alîkariyê li Münsterê pê pere ye. Eger gelek zarokên we hebin, divê hûn perê yekê/yekî bidin ango yê zêdetir bidin.

> **Ji bo pîrsên we:**

Fachstelle Elternbeiträge, Tel. No. 02 51/4 92-51 47
 (Navnîşan binêhire rûpel 22)

Pêşkeşiya demdemîn

Ji bo zarokên ku hîn ciyên wan yê alîkariyê tuneye, li hin taxên bajêr û di avahiyên peneberan de ji bo zarokan û malbatên wan pêşkeşiyên komî tîn pêkanîn. Ev bê pere ne.

> **Ji bo pêrên we:**

Stabsstelle Planung von Kindertageseinrichtungen,
 Tel. No. 02 51/4 92-51 33 (Navnîşan binêhire rûpel 22)

Alîkarên ziman û yê çandê

Eger hewce be, alîkarên ziman û yê çandê yê bi pir zimanin di axaftinê bi kitayê re alîkariya we dikin. Fermo serî li kita xwe bidin.



Dibistanên li Münster

Cîh û Dem, ji bo baş fêrbûnê

Li Almanyayê mecbûretiya çûna dibistanê heye eger zaroka we bibe salî. Divê her zarok herî kêm deh salan here dibistanê. Formên cûda yê dibistanan hene. Bi esasî pêştî dibistana bingehîn (heta pola 4.) dibistana berdewam heye heta pola 10. Yan jî heta Abiturê, piştî 12 yan jî 13 salan.

Kîjan dibistan ji bo zaroka min e?

Li Münsterê gelek dibistanên cûr bi cûr hene. Çûna dibistanên dewletê û yê dêrê bê pere nin, çûna dibistanên pîrîvat (şexsî) divê hûn muhtemelen pera ji bo dibistanê bidin. Di internetê de Schuldatenbank (banka agahiyên dibistanan) heye, ku tê de hemû dibistan hene: www.stadt-muenster.de/bildung

Ji bo hilbijartina dibistana rast ji bo zaroka we Bildungsberatung (Şêwirmendiya perwerdeyî) alîkariya we dike.

> **Ji bo pîrsên we:**

Bildungsberatung, Tel. No. 02 51/4 92-28 28
 (Navnîşan binêhire rûpel 20)





Şêwirmendiya Perwerdeyî

Agahdarkirin, Şîretkirin û Alîkarîkirin

Şêwirmendiya bajarê Mûnsterê alîkariya dê û bavan, zarokan, ciwanan û ya ciwanên mezin di pirsên li ser dibistan û perwerdeyî de dike. Armanca şêwirmediyê ev e ku, ji bo herkesî dibistaneke rast, alîkariya pêşkeşiyên lêhatî û riya perwerderiya baş were dîtin.

Şêwirmendiya perwerdeyî alîkariya we dike

- hûn di pêşkeşiyên piralî de xwe baş agahdar bikin.
- di hilbijartina forma dibistanê de, lê performans û daxwazên zaroka we were.

Şêwirmendiya perwerdeyî agahdar dike

- li ser sîstema dibistanê, îmkanê berdewamiyê û dibistanên li Mûnsterê.
- li ser kursên zimanê Almanî û dersên bi zimanê ji welatên hûn jê hatine.

Şêwirmendiya perwerdeyî şîretan dide

- li ser plana kariyera dibistanê, mezûniyetên dibistanê, îmkanên guhartin û berdewamiyên dibistanê.
- şexsî, telefon û bi E-Mail.

Şêwirmendî bê aliy e, belaş e û bi gelek zimanan mumkûn e.

> Ji bo pîrsên we û daxwaza Terminan:

Bildungsberatung, Tel. No. 02 51/492-28 28
(Navnîşan binê hire rûpel 20)

• Dibistana pêşîn

Di çar salên ewil de zaroka we diçe dibistana pêşîn. Hûn dikarin bi awayekî azad biryarê bidin ku zaroka we here kîjan dibistanê.

Ji ber ko zarokên hemsalî hewceyên demên fêrbûna cûr bi cûr in, sinifên 1 û 2 weke dema destpêka dibistanê dimeşin, ew dikare salekê yan jî sê salan berdewam bike. Zarok dikarin ji hev cû de gorî temenê xwe yan jî di grupên temenê wan ne weke hev in de dersê bibînin.

• Dibistanên Berdewam

Ji sinifan 5 pey ve mavê we heye hûn di navbera formên dibistanê yê cûr bi cûr de hilbijêrin: dibistanên pêşîn (Hauptschulen), dibistanên real (Realschulen), dibistanên tevayî (Gesamtschulen), yê dibistana navend (Sekundarschule) û lîseyan (Gymnasien). Xwendekarên kur û xwendekarên keç yê ji derveyî welat tên, dikarin herin dibistanên ku, ew li wê derê bi taybetî di fêrbûna zimanê almandî de alîkariyê bibînin.

• Pêşkeşiyên taybet yê dibistanê

Serda jî li Mûnsterê dibistana model PRIMUS heye (Sinifên 1 ta 10), dibistana Montessori-Schule (Sinifên 1 ta 10) û dibistana Waldorfschule (Sinifên 1 ta 13).

• Koleja pişê

Pêkanîna erka çûyîna dibistanê ji bo ciwanên nû hatine bi çûyîna koleja pişeyekê yan jî ya lîseyekê jî dibe.

Mezûniyet

Li hemû dibistanên berdewam de û li kolejên pişeyan zaroka we gorî xebata xwe serkeftî şadetiya kalîfîyeyê hildigre. Gelek rê hene ji bo bêdestxistina mezûniyeteke baş ji dibistanê. Divê hûn bizanibin: sîstema dibistanê guhartinê qebûl dike, îmkan heye di navbera formên dibistanan de gorî xebata serkeftî guhartin çê bibe.



Qeyidkirin ji bo Dibistanê

Dibistan her sal di havînê de dest pê dike. Qeyidkirin ji bo dibistanan di meha 11. de beriya destpêka dibistanê pêk tê. Qeyidkirin ji bo dibistanên berdewamî di meha sebatê de beriya destpêka dibistanê pêk tê. Hûn dikarin bi awayekî azad dibistanekê hilbijêrin, lê belê tenê qeyda xwe li dibistanekê çê bikin.

Eger hûn nûh werin Münsterê û li dibistana lêhatî bigerin, raste rast serî li Bildungsberatung bidin

> Ji bo pirsên we:

Bildungsberatung, Tel. No. 02 51/492-28 28
(Navnîşan binêhire rûpel 20)

Fehsa doktorî

Her zarok yê ku dest pêdike diçe dibistanê, ji aliyê doktorekî mêr yan jî ji aliyê doktora jin yê dibistanê ve tê fahsa kirin. Ev fahsa ji bo we belaş e û ji aliyê dibistanê ve tê organîze kirin.

> Ji bo pirsên we:

Gesundheits- und Veterinäramt, Tel. No. 02 51/492-54 11
(Navnîşan binêhire rûpel 22)

Alîkarî li dibistanên paşnîvro û yên temamê rojê Li gelek dibistanan ders heta nîvro tê dayîn. Pir caran dibistan ji bo paşnîvro alîkariyê pêşkeş dikin û xwarina nîvro didin. Ji bo vê alîkariyê di despêka dibistanê de qeyidkirin divê, ku ew ji bo temamê çûna dibistana pêşî derbas dibe. Dibistan hene ku li wan temamê rojê ders tê dayîn.

Xwe ji bo dibistanên temamê rojê û yên paşnîvro alîkariyê didin li Schuldatenbank (Banka agahiyên dibistanan) : www.stadt-muenster.de/bildung agahdar bikin.

Alîkariyên diravî

Çûna dibistanên fermî li Almanyaya ji bo dê û bav û zarokan belaş e. Mesrefê ku di pêvajoya çûna dibistanê de derdikevin, weke perê pirtûkên ji bo dibistanê, perê rêya çûna dibistanê yan jî yê gera bi sinifê re, dikarin di bin mercên taybet de alîkariya diravî were daxwazkirin. Agahiyên di vê derheqê de dibistan dikare bide we.

Tercumanî di axaftinên bi dê û bavan re

Dibistan dikarin ji bo axaftinên bi dê û bavan re daxwaza tercumanên mêr yan jî tercumanên jin bikin. Ev ji bo babetên yasayî, yên weke şadetî, not yan jî neqilîkirinê pêvîst e. Termînan dibistan çê dike. Ev ji bo dê û bavan bê pere ye.

Ziman- û Çandzane

Axaftinên di navbera dê û bavên hatine vê derê û di navbera dibistanê de bi alîkariya ziman- û çandzaneyên mobil jî pêk tê. Wan dersên navçandî ditine û bi pirzimanî dixebitin. Xebata wan ji bo dê bavan bê pere ye. Termînan dibistan çê dike.

> Ji bo pirsên we:

Bildungsberatung, Tel. No. 02 51/492-28 28
(Navnîşan binêhire rûpel 20)

Tercumekirina birûmet

Kitas û dibistan dikarin ji bo axaftinên xwe yên bi dê û bavan re, yên ku hîn bi zimanê Almanî baş nizanin, pirsax daxwaza tercumanên jin yan jî yên mêr yên ku birûmetî dixebitin yên Kommunalen Integrationszentrums bikin.

> Ji bo pirsên we:

Kommunales Integrationszentrum Münster
(Navenda Integrasyonê ya Şaredarî Bajare Münster)
Tel. No. 02 51/492-70 83 (Navnîşan binêhire rûpel 23)





Alîkariya ziman û kursên ziman

Ziman kilît e

Bi zimanê Almanî zanîn ji bo rêya perwerdeyiyeke baş girîng e. Li Mûnsterê gelek pêşkeşî hene ji bo alîkariya ziman ji bo zarokan û ciwanên di her salî de.

Alîkariya ziman li Kita

Li Kitayan zarokên piçûk bi listikê fêrî zimanê Almanî dibin. Perwerdekarên mêr û perwerdekarên jin pêşveçûna ziman dinirxînin. Eger pêvîst be mavê we li ser alîkariya biarmanc ji bo zimanê zaroka we heye. Hinek Kîtas pêşkeşiyên ziman yên bi hev re jî ji bo dê û bavan çê dikin. Li ser vê bi rêvebirên Kita xwe re bi axafin.

> Ji bo pirsên we:

Stabsstelle Planung von Kindertageseinrichtungen,
Tel. No. 02 51/492-51 33
(Navnîşan binêhire rûpel 22)

Testa ziman ya beriya dibistanê

Di Kitayan de ji bo pêşketina ziman ya hemû zarokan alîkarî tê kirin, tê berbiçav kirin û tê nivisandin. Eger hûn weke dê û bav dukumasyoneke weha nexwazin, zaroka we di çar saliya xwe de beşdarî testeke ziman dibe. Ev ji bo zarokên çar salî yên ku naçin Kita jî derbas dibe. Ji bo zarokên ku pêwîstiyên wan bi alîkariya pêşvebirina ziman hebe, li Mûnsterê alîkariya wan li Kîtas tê kirin

> Ji bo pirsên we:

Bildungsberatung, Tel. No. 02 51/492-28 28
(Navnîşan binêhire rûpel 20)

Alîkariya Ziman di dibistanê de

Zarok û ciwan yên ji derveyî welat tèn Mûnsterê, di fêrbûna zimanê Almanî de alîkariya wan tê kirin. Di hemû formên dibistanan de, dibistan hene ku di vî warî vê weke xaleke girîng û taybet dibînin.

> Ji bo pirsên we:

Bildungsberatung, Tel. No. 02 51/492-28 28
(Navnîşan binêhire rûpel 20)

Ders bi zimanê welatê hûn jê tèn

Pir caran zarok û ciwanên ku tèn vê derê bi pirzimanî mezin dibin. Ji bo ku zimanê wan yê devera ku ew jê tèn karibe were parastin û were pêşxistin, bi zimanê welatên ku ew jê tèn ders jî tê dayîn. Vê gavê bi zimanê: Albanî, Erebi, Italî, Xirwatî, /Serbî/Bosnî, Yunaniya nûh, Polonî, Portekîzî, Rusî, Îspanî û Tirkî ders tê dayîn.

> Ji bo pirsên we:

Fachstelle Personalangelegenheiten, Einschulung,
Tel. No. 02 51/492-40 54





MitSprache-Kursên tahtilê

Di tahtilê de kursên ziman yên intensiv hene ji bo xwendekarên kur yên xwendekarên keç yên ku salên wan ne weke hevin. Pêşkeşî dewamî tê berferê kirin û bi formatên nûh zêdetir dibin. Fermo xwe li ser kursên nûh di malpera internetê de ahagdar bikin: www.stadt-muenster.de/schulamt/zuwanderung-und-schule/deutsch-lernen/aktuelles-zu-den-mitsprache-kursen.html

> Ji bo pirsên we:

MitSprache, Tel. No. 02 51/4 92-40 28
(Navnîşan binêhire rûpel 20)

Club D

Ji sala 2004 pêve li Volkshochschule Münster (Dibistana gel ya bilind) alîkariyên din jî tîn pêşkeş kirin Club D ji bo ciwanên ku zimanê wan yê dayikê ne Almanî ye. Di bin durîşma „Mitreden auch auf Deutsch“ „bi zimanê Alman jî bipeyêve“ dikarin xwendekarên kur û xwendekarên keç yên sinifin 5 ta 13 Almaniya xwe baştir bikin. Ev kursana bê pere ne.

> Ji bo pirsên we:

Volkshochschule Münster, Tel. No. 02 51/4 92-43 62
(Navnîşan binêhire rûpel 21)



Bi hev re fêrbibin

Ji bo zarokên li Kita û yên li dibistanê alîkariya taybet

Di Kitas û dibistanan de li Münsterê ciyê hemû zarokan baş e – zîrekiya wan çawa dibe bila be. Zarokên ku alîkariya taybet divê yan jî bê alîkariya taybet li vê derê bi hev re fêr dibin û ji hev fêr dibin.

Perwerdeya bi hev re li Kita

Gelek Kitas gorî ihtiyacên zarokan hatine amade kirin, yên kêmasiyeke wan hebe yan jî ihtiyaca wan ji alîkariyeke taybet re hebe. Ev kîjan Kitas in, hûn dikarin li ser Kita-Navigator wan bibînin: www.kita-navigator.stadt-muenster.de
Alîkariya şewirmendiyê bixwazin.

> Ji bo pirsên we:

Stabsstelle Planung von Kindertageseinrichtungen,
Tel. No. 02 51/4 92-51 33 (Navnîşan binêhire rûpel 22)

Bi hev re fêrbûn li dibistanê

Bi esasî hemû zarok û ciwan li Münsterê – yên bi alîkarî yan jî bê alîkarî – dikarin herên dibistaneke gelemperî. Xwendekarên kur û xwendekarên keç yên ku ji bo wan alîkariya taybet ya pedagojîk hatiye tespît kirin dikarin herin Förderschule (Dibistana alîkar) jî. Li ser vê alîkariya şewirmendiyê bixwazin.

> Ji bo pirsên we:

Schulamt für die Stadt Münster, Tel. No. 02 51/4 92-40 09
(Navnîşan binêhire rûpel 20)





Destek û Alîkari

Alîkarî ji bo dê û bav û ji bo zarokanr

Li ser pirsên gelemperî yên li ser malbatê, dê û bavatî û perwerdeyî hûn dikarin şewirmendiyê di Familienbüro (buroya malbatê) de bixwazin. Ewê alîkariya we bike ji bo we kesekî mesûl ji bo pirsên we bibîne. Eger hûn bixwazin Familienbüro têkiliyan jî datîne.

Ji bo axaftinê kesekî, ku karibe muhtemelen tercume bike bi xwe re binin.

> Ji bo pirsên we:

Familienbüro, Tel. No. 02 51/492-51 08
(Navnîşan binêhire rûpel 22)

Das Kommunale Integrationszentrum der Stadt Münster (Navenda întegrasyonê ya taxê ya bajarê Münsterê) alîkariyê dike ji bo dê û bavan yên ku nû hatine bi rêya hevaltiya perwerdeyî- û fêrbûnê û wekî din jî bi programên ziman û fêrkirina dê û bavan.

> Ji bo pirsên we:

Kommunales Integrationszentrum Münster,
Tel. No. 02 51/492-70 83 (Navnîşan binêhire rûpel 23)



Alîkarî

Di pirsgirêkên dibistanî de

Car caran zarok û ciwan xwe li dibistanê baş hest nakin yan jî pirsgirêkên wan hene. Ev dikare xwe di cûr bi cûr qonaxan de nîşan bide.

Weke mînak:

- Tirsên wan hene.
- Fêrbûn ji bo wan dijware.
- Ew nikarên xwe konsantre bikin yan jî dilê wan naxwaze.
- Pirsgirêkên wan bi hevalên xwe yên xwendekar re hene yan jî bi mamosteyê xwe re hene.
- Ew naxwazin êdî herin dibistanê.
- Di ders çêkirina li malê şitres heye.

Ji bo kêşeyên li dibistanê divê hûn herin cem Mamosteyên sinifê. Xeynê vê jî li gelek dibistanan karmendên şewirmendiyê hene yan jî karmendên mêr û yên jin yên civakî yê dibistanê hene. Di van hemû rewşan de meriv dikare here cem alîkarên pisîkologên dibistanê jî. Pisîkologên mêr û yên jin yên dibistanê bi çavekî bêalî jî derve li rewşê dinêherin. Ew axaftin û tespîten pisîkologên dibistanê bikar tînin ku karibin rewşên giran baştirin fêm bikin û ji wan re çereseriyekê bibînin. Xeynê vê jî ciyê şewirmendiyê ya pisîkolojîk ya dibistanê dikare di nakokiyên de yên di navbera dê û bavan û dibistanê de navengiyê bike.

Dê û bav, xwendekar yên kur xwendekar yên kec, dersdar û pedagojên pirspor dikarin serî li ciyê şewirmendiyê bidin.

> Ji bo pirsên we:

Schulpsychologische Beratungsstelle,
Tel. No. 02 51/492-40 81 (Navnîşan binêhire rûpel 21)



Bîrfan karê bihev re ye

Xebata dê û bav li dibistanê

Hûn weke dê û bav di rêya perwerdeyayîyê de bi zarokên xwe ve dimeşin. Ji ber vê jî ji bo dibistanê hûn hevalbendekî girîngin û hevalbendên zarokên xwe yên perwerdeyî û îrfanê ne. Van îmkanan bikar bînin, bi dibistanê re di têkiliyê de bimînin û li wê derê çalak bin.

Êvarên dê û bav

Li hemû dibistanan di sala dibistnê de gelek caran Elternabend (êvarên dê û bav) pêk tên. Li wê derê dersdar li ser rewşa di sinifê de agahiyan dide, li ser naveroka dersê, amûrên dersê, geran yan jî li ser çûyina sinifi ji bo derekê dipeyive. Êvarên dê û bav îmkaneke gelek baş e, ji bo naskirina dê bavên din jî

Rojên axaftina bi dê û bav re

Di her nîvsala dibistanê de carekê roja axaftina bi dê û bav re pêk tê. Di axaftinên bi we re dersdar we li ser pêşveçûna zarokên we li dibistanê agahdar dikin.

Axaftinên bi dê û bav re

Ne hewceye hûn li benda roja axaftina bi dê û bav re bisekinin, eger hûn bixwazin bi mamosteyekî yan jî bi mamosteyekê ya zarokên xwe ve biaxifin. Hemû dersdar saetên xwe yên ji bo axaftinê pêşkeş dikin. Hûn dikarin li ba sekreteriya dibistanê jî bo axaftina bi dersdar re termînenekê çê bikin.



Eger ji bo axaftinan tercuman pêvîst be, ji bo we tercumanê mêr û tercumana jin, ziman- û çandzane yan jî tercumanê mêr û tercumanên jin yên karmendê bi rûmet amadenin. Termînê dibistana we çê dike.

Beşdarî xebatê bibin

Eger hûn bixwazin beşdarî xebata jiyana dibistanê bibin, ji bo wê gelek îmkân hene:

Alîkariya sinifê, alîkariya dibistanê, komela alîkariyê yan jî konferansa dibistanê. Hûn dikarin beşdarî konferansên pîrspor bin yan jî komên xebatan bin jî.

Dê û bav ji bo gelek çalakiyên dibistanê hewce ne û li benda hatina wene, hûn dikarin bi vî awayî jiyana dibistanê nas bikin û wê ava bikin. Bi rêvebirên sinifê yan jî bi rêvebirê dibistanê re biaxifin.





Fallscouts

Gihîştin û Berdewamkirin

Li Münsterê heşt Fallscouts di karê mobil de dixebitin, ku hewce be ji bo xwendekarê kur û xwendekara kec, dê û bavan yên ku nûh hatine û dersdaran jî agahdar dikin û alîkariya wan dikin. Ew îmkanên alîkariyê û yên destekê li bajêr dizanin, ji bo çûna dibistanê refekat dikin, ji bo têkiliyên torê dixebitin û ji bo alîkarî bigêhêje ciyê xwe hewil didin.

Cafê dê û bavan

Di xaniyên ji bo penaberan de Fallscouts Elterncafé organîze dikin. Li vê derê jî dê û bav dikarin xwe li ser babetê derheqa dibistanê de agahdar bikin.



Ji bo pirsên we

Fallscouts (Navnîşan binêhire rûpel 20 û 21)

Proje

„tu gihîştî bajarê xwe Münsterê“

Ev piroja bi hevkarîya navbera Amt für Schule und Weiterbildung, Ministerium für Schule und Bildung des Landes NRW û Walter Blüchert Stiftung ava bû.

Ciwanên koleja kar yê bajêr ku nûh hatine li Münsterê li vê derê pêşkeşî yê belaş ji bo demên vala û fêrbûnê û alîkariya ji dibistanê derbasbûyîna kar dibînin.



Ji bo pirsên we:

Projeya „angekommen in deiner Stadt Münster“,
Tel. No. 02 51/4 92-28 14 oder 02 51/4 92-28 15
(Navnîşan binêhire rûpel 21)



Amt für Schule und Weiterbildung

Friedrich-Ebert-Straße 110, 48153 Münster
Tel. No. 02 51/4 92 - 4001
bildung@stadt-muenster.de

Bildungsberatung

Hafenstraße 32, 48153 Münster
Tel. No. 02 51/4 92 - 28 28
bildungsberatung@stadt-muenster.de

- Christine Czepok
- Judith Bischoff
- Esther Bückmann
- Kerstin Heitkemper
- Viktoria Makejkin
- Jasmina Schäfer
- Nicole Suchanek
- Olga Wilms

Di şewirmendiya perwerdeyî de pêwîst be bi
pirzimnâî şîret tên kirin.

MitSprache

- Dr. Agnieszka Gedack, Tel. No. 02 51/4 92 - 40 28
gedack@stadt-muenster.de
- Fiona Schuller, Tel. No. 02 51/4 92 - 40 08
SchullerF@stadt-muenster.de

Fallscoots Grundschulen

Amt für Schule und Weiterbildung

- Nora Walters, Tel. No. 02 51/4 92 - 28 86
walters@stadt-muenster.de
- Eva Brüning, Tel. No. 02 51/4 92 - 28 23
BrueningE@stadt-muenster.de

Fallscoots weiterführende Schulen

Verbund Sozialtherapeutischer Einrichtungen NRW e.V.

- Fiona Hinz (Taxa bajêr Nord, Nordost)
Tel. No. 01 78 / 4 70 58 24, hinz.fallscout@vse-nrw.de
- Joana Harmus (Taxa bajêr Südost)
Tel. No. 01 78 / 4 70 59 12, harmus.fallscout@vse-nrw.de
- Katharina Schöne (Taxa bajêr West)
Tel. No. 01 78 / 4 70 59 70, schoene.fallscout@vse-nrw.de
- Anna Nienerowski (Taxa bajêr Südwest)
Tel. No. 01 78 / 4 70 58 37, nienerowski.fallscout@vse-nrw.de
- Phillip Naumann (Taxa bajêr Südwest)
Tel. No. 01 76 / 14 70 57 41, naumann.fallscout@vse-nrw.de
- Ludgera Voß (Taxa bajêr Südost)
Tel. No. 01 78 / 4 70 58 19, voss.fallscout@vse-nrw.de

Projeya „angekommen in deiner Stadt Münster“

- Lukas Klee, Tel. No. 02 51/4 92 - 28 14
KleeLukas@stadt-muenster.de
- Annette van Bebber, Tel. No. 02 51/4 92 - 28 15
vanBebber@stadt-muenster.de

Volkshochschule Münster

Aegidimarkt 3, 48143 Münster

- Heike Epping-Hellrung, Tel. No. 02 51/4 92 - 43 62
Epping-Hellrung@stadt-muenster.de

Schulpsychologische Beratungsstelle

Klosterstraße 33, 48143 Münster
Sekreteriya, Tel. No. 02 51/4 92 - 40 81
schulpsy@stadt-muenster.de

Schulamt für die Stadt Münster

Friedrich-Ebert-Straße 110, 48153 Münster
Sekreteriya, Tel. No. 02 51/4 92 - 40 09
schulaufsicht@stadt-muenster.de

Amt für Kinder, Jugendliche und Familien

Familienbüro

Junkerstraße 1 (Koşeyî Hafenstraße), 48153 Münster
Tel. No. 02 51/4 92 - 51 08
familienbuero@stadt-muenster.de

Fachstelle Elternbeiträge

Hafenstraße 30, 48153 Münster
• Silvia Siewert, Tel. No. 02 51/4 92 - 51 47
SiewertS@stadt-muenster.de

Beratungsstelle für Kindertagespflege

Hafenstraße 30, 48153 Münster
Tel. No. 02 51/4 92 - 56 80
kindertagespflege@stadt-muenster.de

Stabsstelle Planung von Kindertageseinrichtungen

Hafenstraße 30, 48153 Münster
• Andreas Wildemann, Tel. No. 02 51/4 92 - 51 33
wildemann@stadt-muenster.de

Gesundheits- und Veterinäramt

Abteilung Kinder- und Jugendgesundheit
Sekreteriya, Tel. No. 02 51/4 92 - 54 11
schularzt@stadt-muenster.de

Kommunales Integrationszentrum Münster

(Navenda Integrasyonê ya Şaredarî Bajare Münster)

Stadthaus 1, Klemensstraße 10, 48143 Münster
• Andreas Scholten, Tel. No. 02 51/4 92 - 70 83
ScholtenA@stadt-muenster.de

Sozialdienst für Flüchtlinge

(Xizmeta civakî ya ji bo penaberên)

Hafenstraße 8, 48153 Münster
• Thomas Schulze auf'm Hofe, Tel. No. 02 51/4 92 - 50 41
schulzeaufmhofe@stadt-muenster.de

Integrationsrat der Stadt Münster

(Konseya Integration bajare Münster)

• Dr. Ömer Lütfü Yavuz, Tel. No. 01 76/25 19 12 57
yavuz@muenster.de

Weşanger Weşandina:

Bajar a Münster ji bo Xwendegeha Navneteweyî
ya Navnetewî û Zêdetir Perwerdehiya
Çileyê 2018, 1000, 4. Vebijêrk û nûvekirî ya nûvekirî